ناوەندی هاوکاریی حیزبەکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Partie
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

**Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, pîrozbahî li Nadiya Murad kir**

»»» R:6




*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (335)07-10-2018 Buha (1000) Tûmen*



## Mistefa Hicrî pîrozbahî li Berhem Salih kir

Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, di nameyekê de pîrozbahî li Dr. Berhem Salih kir.

Bi boneya hilbijartina Dr. Berhem Salih bo posta serkomariya Îraqê, Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê Hizba Demokrat, di nameyekê de, pîrozbahî jê kir.

Deqa nameyê wiha ye:

Rêzdar Dr. Berhem Salih
Silav û rêz
Bi boneya hilbijartina we rêzdarî bo serkomariya Îraq a Federal, bi germî pîrozbahiyê li we dikim, û hêvî dikim, ku di vê berpirsayetiya nû de, li ser bingehên yasaya bingehîn ya Îraq a Federal, û riha hevkarî û bihevrejiyana gelên wî welatî serkevtî bin.

Digel rêz û hurmeta dubare

Partyia Demokrat a Kurdistana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mistefa Hicrî

12`ê Rezbera 1397`an
4`ê Çiriya Pêşin a 2018`an

# Manovra tirs ji Kurdistanê



Di heyama hefteya borî de û piştî şikestxwarina di operasiyona tirsinokane ya mûşekbarana binke û baregehên Hizba Demokrat û derketina emniyeta derevîn ya wê di pêvajoya rêjeya leşkerî ya Spaha Pasdaran di salvegera destpêka şerê malkambaxker ê 8 sale di navbera Îran û Îraqê de li Ehwazê, Komara Îslamî bi armanca çavtirsandîkirina xelkê asayî ku di 21`ê Xermananê de "Na"yeke bihêz gotne rejîma Îranê, û bo bexşîna moraleke nû bi çekdarên xwe yên tirsonek manovreke sertaserî li ser Kurdistanê, li Îranê de bi rê ve bir.

Di vê manovra leşkerî de, ku Spaha Pasdaran encam da, mifah ji hemû cureyên çekên pêşkevtî hate wergirtin ku ji Rûsiyê û Çînê hatibûne wergirtin, ku rejîmê bi herzanfiroşkirina av û xaka Îranê bi dest xistibûn.
Roja 12`ê` Rezberê di heman çarçoveyê de Xamineyî di stadyoma Azadî ya Tehranê de, dinava besîciyên kirêgirtî de, cuda ji mehtkirina rejîma xwe û cinayetên çar dehikên borî, bas ji vê kiriye ku em şanaziyê bi dîrok û derbazbûyiya xwe dikin, ku nerasterast şanazî kirine bi vê deshilata ku wan serdemekê wekî Taxût bi nav dikirin.


Pirsa balkêş ew e ku rejîmê ji tirsa vê ku heta beşeke ji karsaz û pasdaran jî amade nebûn, beşdariyê di manovrê de bikin, bi gefxwarin û lahîkirin û timayîbirina wan bi pere, xelk biribûn cihê manovrê, û bi vî rengî mijûlî manovrê û mehtkirina xwe bûn.

Ew manovr ku bi çekên giran û nîvegiran hate encamdan, cardin di Kurdistanê de, derûna

»»» R:3

## Ji peravên Medîterane ve ber bi Tehranê

»»» R:2




## Bandora dorpêçên Amerîkayê li ser Îranê

»»» R:4




## Derheq 21`ê Xermanana 1397`an de

»»» R:5



## Rojjimêra topbaranan ji aliyê Spaha terorîstî a Pasdarên Îranê ve

»»» R:7



## Sergotar

### Ji peravên Medîterane ve ber bi Tehranê

N: Kerîm Perwîzî

Rejîma Îranê çend salan berî niha ku serhildana xelkê li Sûriye dest pê kir, ji tirsa rûxana Esed ê hevalbendê xwe, bi hezaran kesî ji hêzên leşkerî şandin wir, û bi sedan milyard Dolarî ji dahata welatê Îranê xerc kir, da ku rejîma tawanbar a Beşar Esed biparêze, û bi hêceta vê bû ku Sûriye û Lubnan û Îraq û kûrahiya stratejîk a rejîmê ne, û heta digotin ku Sûriye ji Xûzistanê jî girîngtir e! Lewra dibe ku di Sûriyê de şer bikin, da ku şer nekeve nava sînorên Îranê de.

Di serdemên kevn de, Hexamenişî ku komeke tayife û qebîleyên koçerî û talanker bûn, û wekî DAÎŞ`ê êrîş kirin ser şaristaniyeta Mad û ew ji nav birin, paşayek bi navê Kembociye heta ser peravê Medîterane çû, û xwast ji vê deryayê debaz be bo Ewropa, û Yûnanê dagîr bike, lê şîpelên behrê hêza wan têk şikand û wî paşayî jî ku xwe wekî Xwedê dida nasandin, ferman da ku behrê bidin ber şelaqan!, piştre li Sûriyê birîndar bû, û li Îraqê de zelîl bû û kete nav ciyan de, û piştre mir!. Dîroka vê navçeyê ecêb dubare dibe!.

Komara Îslamî jî wekî piraniya herî zêde ya deshilatdarên nîve çolistana felata Îranê, ku hest bi vê kirine ku bi hovîtiyê hinek hêz ji xwe re peyda kirine, û şaristaniyeta navçeyê wêran kiriye, timayiya wan çûye gihîştin bi Medîterane û derbazbûn bo Ewropayê. Lê gihîştina bi peravên Medîterane xala dawiyê ya sefera wan bûye, û bi şîpelekê xistine nava paytextên wan de, û dawî bi deshilata wan hatiye anîn.

Komara Îslamî digot ku dibe li Sûriyê şer bike, da ku şer di nava sînorên xwe de neke. Di rojên borî de li Laziqiye û peravên Medîterane firokeya Îsraîlî û navçeya Firansewî, êrîş kirin ser barên teqemenî û mûşekên Spaha Pasdaran, û derbeke giran li wan dan.



Piştre welatên Firansa û Almanyayê û serokê Nato û kesên din jî ragehandin ku hêzên Spaha Pasdaran û rejîma Îranê dibe li Sûriyê bêne derkirin.

Şerek ku Komara Îslamî digot li Sûriyê dike û ji xûzistanê pê girîngtir e, li Ehwazê pêsîra wê girt, û xamineyî biryar derkir ku behrê bidin ber mûşekan! piştre ji tirsa de, li Tehranê hewl dan, sedan hezar besîcî û kirêgirtiyên xwe kom bikin, ku ne eva ku xelkê bitirsînin, belku tirsa xwe ji herifîna rejîma xwe veşêrin.

Niha seranên rejîmê bi eşkere dibêjin ku şer birine nav mala wêran ya rejîmê, îca bi navê şerê aborî yan şerê medyayî û rewanî yan her naveke din be, ew yek bixwe qebûlkirina vê ye, ku şer birine nava mala wêran ya wan de, û xelk ditirsandin ku bila Îran wekî Sûriye lê nehê, lê niha dibêjin ku me wekî Yemenê lê kiriye!.

Eva rewta dîrokê û bingehên serekî ên siyasetê û berbirûbûna hêz e, ku di navçeyeke hestiyar a wekî Rojhilata Navîn û xelkê çendreng û çend neteweyî ya vê navçeyê, derfet bi hêza serberedayî û tevdanîker a wekî Komara Îslamî nade, ku zêdexwaziyê bike, û tu deshilateke tawankar, ku xelk li piştê nebe, û di navxwe de rizî be, nikare bo heyameke dirêj, bi nimayişa leşkerî û destêwerdana di nava karêbarên welatên din temenê xwe dirêj bike, û ew şaşiyên ku dikin, dibe belayek bo canê wan.

Şelaq lêdan li behrê, rejîma stemkar ji şîpelên deryaya xwestek û daxwaziyên xelkê naparêze, û bi lehiyekê koşka rizî ya deshilata Tehranê diherife û di dîrokê winda dibe.

## Navenda Siyasî ya PDKÎ peyameke pîrozbahiyê bi boneya birêveçûna hilbijartina parlementoya Kurdistanê belav kir



**Navenda Siyasî ya PDKÎ derheq birêveçûna serkevtiyane ya hilbijartinên Kurdistanê, peyameke pîrozbahiyê belav kir, û hêviya berbipêşveçûna serkevtiyane ya deshilata siyasî ya Herêma Kurdistanê xwast.**

Deqa peyamê weha ye:
Peyam derheq birêveçûna hilbijartina parlementoya Herêma Başûra Kurdistanê


Piroseya hilbijartinan ji bilî hinek kêmasiyan û şikayeta hizban li ser hev li ser bingeha yasaya hilbijartinê û rêûşûnên komîsyona hilbijartinê gihîşte encamê, lewra bi giştî hilbijartineke demokratîk tê hesibandin ku eva di cihê xwe de, pêgihîştina siyasî ya xelkê û hizbên siyasî yên Herêma Başûr a Kurdistanê diselimîne.

Roja Yekşemiyê 30`ê Îlonê (08.07.1397)`an hilbijartina parlementoya Herêma Başûra Kurdistanê bi çavdêriya komeke çavdêrên navdewletî bi rê ve çû.

Di vê derheqê de ji aliyê rêbertiya PDKÎ ve em pîrozbahiyê dibêjne vê serkevtina xelkê Kurdistanê, û hizbên beşdar di hilbijartinê de, û em hêvî dikin ku di parlementoya bê de, roleke bibawer di pêxema vegeşandina demokrasiyê û ber bi pêşveçûna deshilata siyasî ya Herêma Kurdistanê bilîze.

PDKÎ
Navenda Siyasî
12.07.1397
04.10.2018

# Rojên çarenûssaz ên Komara Îslamî di rê de ne





N: Şemal Terxîbî

Rêkevt 13`ê Gelawêja îsal dewleta Amerîkayê paş vekişiyan eyekalî ya xwe ji rêkkevtin-nameya naskirî bi Bercamê gera yekem ya tehrîmên helavîstî bo ser Komara Îslamî dest pê kir, piştre ku tehrîm hatin sepandin, derket ku berevajiyê îdiayên se-ranên rejîma Îranê aboriya wê ew qas jî xweragir nîne ku li hemberî zextê de xwe ragire.

Beşeke berçav ji kompaniyên biyanî Îran bi cih hêlan û tevî hilweşandin yan helavîstina rêk-kevtinên xwe, dilxweşiya Komara Îslamî li hemberî qewl û sozên berê ên xwe kirin bilqa ser avê, ji aliyekî din ve jî sermayedanerên navxweyî jî bi xwe de hatin û sermayeyên xwe ji bazarê vekişandin, ku ew du mesele bûne sedema pêkhatina kirîzeke metirsîdar di aboriya Îranê de, bi awayekî ku herwekî ku di dawî rapor û nûçeyan de xûya dike, beşeke berçav ji yekîneyên ber-hemhîner ên biçûk û navgîn hatin daxistin û berhemhînerên mezin jî neçar bûn ku bi nîveçalakî dirêji-yê bidin karên xwe, ew mesele jî bû sedema zêdebûna rêjeya bêkarî û giranbûna beşek ji hewcehi-yêmn jiyana rojane ya xelkê. Cuda ji vê hevkêşeyê, nehatin yan kêmtir hatina madeyên destpêkî bi sedema tehrîman û daketina nirxa Tûmen û bilindbûna nirxa erzên biyanî wisa kir ku bazar digel kêmiya erx berbirû bibe, ew rewşa bi taybetî wê demê zêdetir derket ku rûniştina salane ya Konseya Giştî ya NY bi rê ve çû, û tê de Trump serokê Amerîkayê cardin pêdagirî kir li ser siyastên dewleta xwe li hemberî Komara Îslmaî û herweha piştî vê ku welatên Erebistanê û Rûsiyê qewl dank u cubrana kêmiya nefta Îranê di bazaran de bikin, nirxa Dolar bo servey 18 hezar Tûmenî û di hinek ciyan de jî hilkişiya bo sînorê 20 hezar Tûmenî.

Ew rewşa ku per û baskên xwe bi ser Îranê de kêşan û herweha nêzî 13`ê Xezelwerê ku tê de gera duy-em ya dorpêçan li dijî Îranê dest pê dikin, ew egera li cem hin ke-san di Îranê de pêk aniye, ku Ko-mara Îslamî bo ragirtina balansê û aramkirina rewşê ku serî bo hinek xwestekên civaka cîhanî rakêşe û aliyê kêm hekî bi awayê tatîkî jî bûbe, dev ji hinek ji siyasetên dijminkarane bo heyameke demkî bikêşe, lê berevajî axavtinên Hesen Rûhanî û Elî Xamineyî ew egera jî ji nav biriye, ku roja Çarşemiyê rêkevt 11`ê Rezberê Hesen Rûhanî serkomar rejîma Îranê di civîna heyeta dewletaî ya rejîmê, pêdagirî li ser vê kiriye ku li rêkevt 13`ê Xezelwerê, tu bûyerek rû nade û Amerîka hemû dorpêçên xwe berî vê rêkevtê cîbicî kiriye. Got jî: Xizîneyên welat tejî ne ji kalayên serekî û rewşa erzî bi awayekî nîne ku civakê tûşî kêşeyan bike!. Hev-dem Xamineyî di stadyoma Azadî ya Tehranê de û din ava hinek ji besîciyên kirêgirtî de, awirek da rewşa Îranê, û bi hestiyar binavki-rina vê rewşê nekarî tirsa xwe ji siberoja nediyar ya rejîmê veşêre, û ji bo parastina deshilata xwe ya biyom hemû welat belaşfiroş kir, û rû li besîciyan got: Hûn bixwe xwediyê welat in. Paşan jî bi anîna mînakln dîrokî ji şerfiroşî û kuştarên dehka 60`î bo serkutkiri-na azadîxwazan ji aliyê besîciyên vê demê ve got: Niha dema we ye ku heman riyê bigrin pêş, û ber bi serkevtina nizamê pêngavan hilgirin.

Di vir de pirsa serekî ew e ku piştî 13`ê Xezelwerê çi rû dide? Gelo Komara Îslamî her wekî ku soz daye diakre kêşeyan çareser bike yan berevajî, kêşe û arîşeyên xelkê di warê çendî û çawaniyê ve zêdetir dibin? Ya ku eşkere ye ew e ku gellek ji berpirsên rejîma Îranê û karnasên karûbarê aboriyê dibêjin ku kêşeya serekî ya rejîmê ne tenê tehrîm û zextên derekî belku kêşeyên navxweyî ne. Li gora gotina yek ji bi nav nûnerên meclisa rejîmê %70 ya kêşe û arîşeyên aborî bi sedema fakterên navxweyî ye ku ên herî girîng pêk tên ji nebûna birêveberiya kêrhatî û dirust, nemana baweriya xelkê, rantxwarî û dizî û gendeliyên hikûmetî, îzin nedana bi vegeşîna aborî di kertê taybet û gellek sedemên bingehîn ên din.

Her di vê derheqê de Ehmed Tewekolî nûnerê rejîmê di me-clisê de, ku niha serokê rêkxirawa Çavdêriya zelalî û dadperweriya welat e, di axavtineké de derheq rewşa jiyana di Îranê de û rewşa aboriya xelkê, ragehandiye: sede-ma serekî ya hemû gendeliyan di Îranê de pêk tê ji binpêkirina mafê kesên kêrhatî û »»» Dom R:8

»»» Doma manşêtê

pirr ji kêşe û dijberiya bi Kurd û Kurdistanê re xiste rû, û ji bilî têkdana warê aramiya xelkê Kurd, bû sedema jinavçûn û şewitandina çendîn hiktar ji daristan û çêrge-hên Kurdistanê.

Her di vê derheqê de li gora nûçeyeke Ajansa "Kurdpa"yê, tenê di roja 13`ê Rezberê de, li quntara çiyayê Şaho, bi topbarana vê zincîre çiyayî, bi taybetî li gundên "Lonî Sadat" û "Têleko", rejîm bû sedema şewitandina çendîn çêrgehan û daristanên vî zincîre çiyayî. Di vê manovrê de, di gundên "Lon" û "Tîleko" çêrgehên "Kanî Zara", "Bîre Hercîne", û "azerd" agir girtin.

Rejîm herwisa di nava bjaran de jî bi bikaranîna rewşa xirab ya aboriya xelkê, dixwaze li jêr navê wergirtina lawên bêkar, bêkarî û destengiya lawan wekî derfeteké bi kar bîne, û ji vê riyê ve lawên kurdistanê di naven-dên serkutkar de bi cih bike, û di demên hewce de wan li dijî neteweya wan bixwe bi kar bîne.

Hemû ew siyasetên rejîma Îranê ku bi siyaseta kurdkuştinê tê naskirin, û dîroka wê vedigere bo destpêka deshilatdariya rejîmê, nîşana ew qasê hovîtî û dijîgelîbûna rejîmê ye. Her di vê çarçoveyê de rejîmê bona tirsandina xelkê, dest kiriye bi wergirtina kesên lat û çeqokêş û şerfiroş, da ku wekî "Şe`ibanên Bêmox" ên serdema deshilata pêşîn bi qazanca xwe mifahê jê wergire.

# Bandora dorpêçên Amerîkayê li ser Îranê



Dr. Rojan Aştab

Yekemîn dewra gemaroyên nû ên Amerîkayê di demekê de dest pê kirin, ku di nava tu yek ji wan aliyan de em nabînin ku kêşe kêm bibin.

Biryar e ku destpêka meha Novembera îsal dorpêçên neftî li ser Îranê dest pê bikin, û bandor û tundiya dorpêçan vê carê zêdetir ji berê dibe.

Bêguman Trump serokê Amerîkayê, li çav Obama serokê pêşîn ê Amerîkayê, helwesteke gellek tundtir derheq Îranê heye, û her di dema piropagendeya hilbijartina serokatiyê ve heya niha gellek bi cidî li dijî Îranê axivî. Îca di hemberî Îranê de nûçeyeke ji vê yekê tundtir xuya nake.
Bi vî awayî tê çaverêkirin ku her ji niha ve kiryar û sewdagerên neftê heya pêş gihîştina meha Novemberê û destpêka dorpêçên neftî ên nû, hêdî-hêdî kirîna nefta Îranê kêm bikin.

Îca hinartina nefta "Kanindis" ku ji nefta xaw siviktir e, û li kêlgehên gaza xwezayî tê derxistin, dikeve bin sîvana dorpêçên Amerîkayê de. Dijayetiya dewletên Ewropî li dijî çûna derve ya Amerîkayê ji rêkkevtina navikî ya Îranê naskirî bi Bercamê nikare bandora xwe li ser van dorpêçan danê.

Renge siyasetvan û yasazan jî tekoşînê bikin, ku riyekê bo kirîna nefta bÎranê bibînin, lê di bîra me de be, ku dewlet kiryarê neft û gaza Îranê nînin, belku kirîn û firotina neftê li stûyê kompaniyên neftî ye.

Hemû evane û ragitina şandina nefta Îranê di asta cîhanî de, guherînkarî di bazarên cîhanê de li pey xwe tîne. Ji meha "July" ya îsal ve şandina nefta reş û sivik ya Îranê heya 430 hezar bermîlî di rojê de kêm kiriye, ku li çav meha Nîsanê bi awayê giştî %15 kêm kiriye. Wate



tenê mehekê piştî vê ku Trump dorpêçên xwe li ser Îranê ragehand, eva di demekê de ye ku niha dorpêça neftî dest pê nekirine, di demekê de ku kompaniyên mezin ên cîhanê deranîn û berhemanîn û kirîna neft û gaz wek "Total" û "Royal Dach shel" her niha kirîna neft û gazê ya Îranê ragirtine, û bi yekcarî ji erhemanîna neft û gaza Îranê vekişiyane, ew jî li ber dorpêçên Amerîka li ser Îranê, ew nûçeya ji aliyê Wezîrê Neftê ve di roja Duşemiyê li parlementoyê de hate ragehandin, ku sala par Kompaniya "Total" bi fermî girêbesta vegeşandina faza 11 ya Parsa Baûr bi qasî 4 milyard û 800 milyon Dolarî digel Îranê wajo kir, lê niha ew şûn bi cih hêalne, û di karkirina bi Îranê re paşve vegeriyane, û Îran bi cih hêlaye.

Her niha piraniya kompaniyayên mezin ên Ewropayê kirîna nefta Îranê yan ragirtine, yan kêm kirine, di meha "July" a îsal de kirîna nefta reş ya Îranê gihîşte 240 hezar bermîlî di rojê de, wate %41 li çav meha Nîsanê kêm kiriye, bi dûr nahê zanîn, ku ew qas jî heya meha Novemerê bigîje sifrê, yan nêzî sifrê.

Di Turkiyê de jî ku xwe wekî hevpeymanê Îranê nîşan dide, derheq kirîna neftê ji Îranê wekî welatên Ewropî di nav siyasetvan û kompaniyayên neftî de girjî û alozî çêbûye, di demekê de ku "Nîhat Zîmkecî" Wezîrê Aboriyê yê vî welatî dibêje, ku dorpêçên Amerîkayê nikarin Tirkiyê bo kirîna nefta reş ji Îranê asteng bike.

Parzîngeha millî ya "Torpas" li meha Nîsana ve heya niha kirîna nefta Îranê %45 kêm kiriye. Li Asyayê jî ku mezintirîn bazara nefta Îranê li wir e, û welatê Kureya Başûr di dawiyên meha Hezîranê kirîna nefta reş û sivik li Îranê ragirtiye.

Renge heya heyameke din veguhastina nefta Îranê bo Îmaratên Hevgirtî ên Erebî û ji vir ve jî bo derve bi tewahî bisekine.
Welatê Japonê jî qet li hemberî dorpêçên Amerîkayê de li dijî Îranê nasekine, û heta di dema serokatiya Obama de jî weha nekir. Di vir de Hindûstan û Çîn cihê baldanê ne, tu yek ji van du welatan heya niha kirîna nefta Îranê kêm nekirine, ji aliyekî din ve Hindustan kirîna neftê bi radeyeke zêde zêde kiriye, û gellek jî di enbrên xwe de paşekevt kiriye, lê wisa dixuye ku ew yek bi awayê demkî be, renge Hindê metirsiya vê yekê hebe ku derheq hewcehiya nefta xwe di Zistana îsal û heya meha Novemberê vî karî bike.

Ew amar nîşan didin ku nefta Îranê berbirûyê kirîzeke mezin bûye, û di heyama çend mehan de 27 milyon bermîl ji berhemanîna neftê daketiye. Bi vî awayî tê pêşbînîkirin, ku kêmkirina kirîna neftê ji Îranê ji aliyê welatên Ewropî û Îmarat û Japonê, hinartina nefta Îranê xwe li 1 milyon û 500 hezar bermîlî di rojê de dide, eva jî rastiyeke haşahilnegir e, ku berbirûyê kirîzeke mezin bûye, û di heyama çend mehan de 27 milyon bermîl ji berhemanîna neftê daketiye.

Ew yek jî zelal e ku dibe her ji niha ve bazara neftê vê kêşeyê cidî wergire, û cihê neftê bigre. Bêguman kes çavnihêriyeke wisa li bandora dorpêçên Amerîkayê li ser Îranê nebûye, her paş wajokirina pêngava yekem ya dorpêçan, bazara Îranê, bi tewahî têk çû, û nirxa fermî û ya Tûmen bi awayekî ecêb daket, ku bi tu awayî bi dewletê jî cîbicî nabe, û jiyana bi milyonan kesî li Îranê xistiye metirsiyê de. Amerîka Komara Îslamî ya Îranê bi metirsî li ser ewlehiya Rojhilata Navîn dizane,û herweha bi piştevaniya girûpên terorîstî tawanbar dike, û dibêje Îran bi dizî ve mijûlî avakirina çeka navikî û mûşekên dûrhavêj e.

Roja 7`ê heyva Ut (16`ê Gelawêjê) ew dorpêç hatin cîbicîkirin, û komek tiştan bi xwe ve digre, wekî kirîna Dolarê Amerîkayî ji aliyê banka navendî ya Îranê herweha bazerganiya zêr û almînyom û pola û hesin û pîşesaziyên derheq maşînsaziya digel Îranê hatin qedexekirin.
Ji aliyekî din ve jî îzna anîna kelûpelan bo çêkirina firokeyên bazerganî û neferhilgir hate hilgirtin, ya herî serekî jî firotina firokeyên neferhilgir bû, bo Îranê paş rêkkevtina navikî wate Bercamê-kompaniyaya

»»» Dom R:8

# Derheq 21`ê Xermanana 1397`an de







Keywan Dirûdî

Ya ku di 21`ê Xermanan îsal li Kurdistanê de rû da, tenê girevgirtineke asyaî nebûye, belku referandomek bû bo "Na" gotina deshilateke xwesepandî.
Ew roja di vî warî de girîng e, ku nîşan da civaka Kurdistanê û hizbên siyasî û çalakên xûya ên navxwe û derve her hemû jî li ser yek tewerî kok û hevdeng in, ku ew jî sepayîbûna deshilata Tehranê bi ser Kurdistanê de bû. Ji vê rojê vêdetir êdî di piratîkê de destewajeya opozisyona seranserî di edebiyata siyasî ya Kurdistan û Îranê de hate helandin.

Herweha derket ku dezgeha piropagendeya rejîma Îranê bi vê hemû xercê ve ku bona qahêmkirina deshilata xwe daye, serkevtî nebûye, di vê de ku şeqekê bixe nava rêzên xelkê û hizbên siyasî ên Kurdistanê de.

Kurdistan di yek ji milîtarîzetirîn rojên xwe de, bi bêy vê ku tu sinduqeke giştpirsiyê danê, bo cara duyem piştî 12`ê Xakelêweya 1358`an Na yeke mezin gote rejîmê, û selimand ku pêdagir e li ser vê biryara ku di 2`ê Rêbendana 1324-an de daye.

Eva bixwe vegerandina mezinahiyeke bêhempa bû bo neteweya Kurd û herweha peyveke zelal jî bû, rû li ewên ku amade ne li ser bingeha rêzgirtina hember, hewl bo vêdebirina sîbera faşîzmê li ser pêkhateyên nav erdnîgariya Îranê bidin.

Encamên 21`ê Xermananê
-Derket ku Kurdistan xwediyê nexşeriyeke taybet e, ku pêdagiriyê li ser berjewendiyên xwe ên bilind dike.
-Ew rastiya hate selimandin ku xebata Kurdistanê rizgarîxwazane ye, û bo vê mebestê jî ji hemû pitansiyelan mifahê werdigre.
-Eşkere bû ku opozisyona seranserî cuda ji çemk û têgeheke "abstract" hebûna wê ya derveyî nîne, û tenê riyeke ku bo giştgîrkirina xebateke berfirehtir li pêşberî xwe heye, pêkve karkirin e li ser bingeha rêzgirtina ji berjewendiyên yektir.

-Ew rastiya hate selimandin ku dibe Kurdistan bibe hêleke mêhwerî bo destpêka tekoşîna hemû aliyane ya azadîxwazên rastîn û pêkhateyên bindest li dijî deshilata serberedayî ya Tehranê.
Hekî ew çar xal wekî derencamên herî serekî li ber çavan bêne girtin, eva pêwîst e ew sedemane jî bêne destnîşankirin, ku ew serkevtina mezin tomar kirin. Di rastî de jî berî her tiştî dikarin bêjin ku ew zemîneya kulturî, dîrokî, û civakî ku di Kurdistanê de hebûye û heye, di nav xwe de, yekem sedem û sedema herî girîng bû.

Hewce ye ku em vê yekê jî ji bîr nekin ku hevdengî û bangewaza hevpar ya hizbên siyasî bo vê armancê bandora xwe ya taybet hem di warê rêkxstin û hem di warê derûnî de li pey xwe hebûye. Berî vê serkvtinê di heyama yek sala borî de zibareya gund û bajar bo parastina jîngehê, hevkarî û bi hawardeçûna giştî bo xelkê navçeyên erdhejlêdayî yên Selas û serpêl, newroza cemedanî û di van dawiyane de jî rêzgirtina ji kesayetî û bîra nîştimanperwerane ya şehîd şerîf Bacwer li piraniya navçeyên Kurdistanê, nîşan da ku Kurd çûye nav piroseyeke nû ya netewesazî de.
Girîng e ku ew yek li ber çavên me be ku pênaseya carr û kilasîk li netewe, herçend ku hêla jî di cihê xwe de ye, lê dibe ku em bizanin ku tuxmên pêkhînerê neteweyeke bindest ê wekî Kurd li rewta dîrokek ji bindestî û li jêr bandordariya nuqteyên kara ên deshilatê wekî perwerde û fêrkariyê, sîstema birokrasî û ragehandin û herweha li jêr kuntrola sîstema xelat û cezakirinê, rastî xisarên mezin û jirêderxistî dibin ku ziman yek ji mînakên wê ên herî berçav e.

Bi vê pêkê em dibe ku riyekê bigrin pêşiya xwe, ku li ser bingeha xwasta hevpar ya giştî de îradeya pêkve çêkirina kiyanekê bo me ava bike, û ew yek jî dibe kevirê xîmê xwepênasekirineke giştgîr ya siyasî û civakî, ku me ji ên din vediqetîne.

Her wekî ku me dît rejîmê li hemberî ekta hevbeş ya rêzgirtin ji kak Şerîf berevajiyê xwesteka derûniya xwe, dest da piropagendeyê û xwast ku digel vê xwesteka hevpar rêk bixe, ku di dawiyê de jî serkevtî nebû, û li cem tu kesî jî veşartî nine, ku dezgeha piropagendeya rejîmê bi vê hemû xercê xwe nekariye xwe biselimîne, û di nava îradeya xelkê Kurdistanê de heliyaye.

Bo dervey Kurdistanê

Bo xweşî ve pêkanîna Navenda Hevkariyê ya Hizbên kurdistana Îranê ew zemîneya pêk aniye ku hêza siyasî ya Kurdistanê tûşî netebahiya siyaî nebe, û yekdengî û yekîtiya navxweyî –serbarê liberçavgirtina pirensîpa piloralîzmê û çendrengiyê –biparêze.
Eva gellek girîng e ku ew pêvajoya dom hebe û digel vê ku girîngtirîn mesele ragirtina vê yekparçeyiyê ye, lê hewl bona bihêzkirina wê, yek ji erkên herî serekî ên dîrokî ye. Her wek em dizanin hizbên siyasî di civaka Kurdistanê de, roleke cuda ji her cihekî din dilîzin, û di form û naverokê de wekî dewleteke dûrxistî ne ku hewce ye bedela dewletekê hakimiyeta giştgîr û berjewendiya neteweyî diyarî bikin û hewla desteberkirin û parastina wê bidin û civakên xelkê jî di vî biyavî de "mobilize" bikin.

Bi liberçavgirtina rewta pêkhateyên nav erdnîgariya Îranê û nîşanên kirîza serûbin ya rejîmê di warê paqijkirin û vemalîn ji rewayiya navxwe, pûçbûna îdeolojîk, şikestxwarina siyaseta derve û herifîna aboriyê û ew pêvajoya ku rejîmê rû bi derve girtiye pêş, hewce ye ku hindî zêdetir dost û hevalbendan ji xwe bibîne, û hem di navxwe ya vê erdnîgariyê û hem di navçe û li derve de, ji hemû vebijêrkan li gora rewşê mifahê wergire. Eva gellek dûr ji çavnihêriyê nine ku Kurdistan bibe cemsereke bibandor û sîvaneke bicoş bo hemû ewên ku pêşeroja xwe di derbazbûna bi ser astengiya rejîma Îslamî de dibînin.

Serkevtina hêza rewa bi ser şiyana bizorî de

Sîstemên deshilatxwaz û otoryanîst bi sedema cewherê xwe bi vê redeyê ku ber bi kirîzê û hilwerîna sermayeya civakî ve diçin, ew qas zêdetir ji şiyana bizorî bo pêşgirî ji nefermaniyan mifaha şaş û berevajî werdigrin, lê di vê rewşê de ku dijberên wan ku piranî hêzên demokratîk in, dikarin ji vê pirsê wekî

»»» Dom R:8

# Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, pîrozbahî li Nadiya Murad kir

**Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, bi boneya wergirtina xelata aştiyê ya "Nobel"ê ji aliyê "Nadiya Murad" keça Kurd ya Êzidî ve, peyameke pîrozbahiyê belav kir.**

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama pîrozbahiyê ya Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, bi boneya wergirtina xelata aştiyê ya "Nobel"ê ji aliyê "Nadiya Murad" keça Kurd ya Êzidî ve

Keça Kurd ya Êzidî a xelkê bajarê Şengalê, û balyoza aştiyê di NY de, "Nadiya Murad" digel "Denis Mukwege" bi hev re xelata "Nobel"ê ya aştiyê ya sala 2018`an bi dest ve anîn.

Sala 2014`an, çekdarên bîrteng û sedsala navînî ên"Dewleta Îslamî di Îraq û Şamê" naskirî bi "DAÎŞ"ê, êrîşî ser bajarê Şengalê kirin û dagîr kirin, û di vê êrîşa dirindane de, mezinatî û hêybeta mirovî ya bi hezaran mirovên bê tawan şikandin, û bo careke din neyarên Kurdistan û Kurd hewla dagîrkirina Kurdistanê dan.
Nadiya Murad, piştî vê ku li ber çavê wê, 5 bira û dayîk û bavê wê bûne qurbaniyê wê zilma mezin, yek ji wan hezaran keçan bû ku ji aliyê vê saziya terorîstî ve hate êxsîrkirin, ku di bajarên di bin desthilata "DAÎŞ"ê de, bo meremên dijîmirovî dihatin kirîn û firotin.

"Nadiya Murad" piştî heyamekê karî xwe ji destê vê saziya terorîstî rizgar bike, û piştî rizgarbûnê, karî bibe dengê wan keçên bêtawan yên ku li jêr destê "DAÎŞ"ê de rastî işkencekirin û çendîn karên xirab yên din hatine.
Nadiya Murad bi hewl û têkoşîna berdewam, bibû hawara ji dil ya mirovheziyê û parastina keraeta mirovî.



Nadiya Murad bi sedema karkirina li ser pirojeya bi navê "Bidavîanîna tundûtîjiyên cinsî, wekî çekeke şer" karî bi hevpariya digel "Denis Mukwege" xelata "Nobel" a aştiyê bi dest xwe bixîne.

Rastiya vê yekê nayê haşakirin, ku di asta azarên Kurd û hemû pêkhateyên Kurdistanê de, her cure xelat û pêzanînek di asta xemên me de nine, lê bihîstina vê nûçeyê ji aliyê ewên regezperestane şev û rojan dikin yek, ew qas hejîner e ku bi qasî hemû wan êş û azaran e ku gehandine Êzidiyan.

Di demekê de, "Nadiya" xelata aştiyê werdigire, ku jinên civaka Îran û bi taybet Kurdistanê, di bin hejmûniya serkutkirinên tund yên bîra "wilayetî Feqîh" de rojane rûbirûyê zilm û bêrêzîkirinê dibin û netirsane bo bidestveanîna mafên xwe di hewlên berdewam de ne.
Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, germtirîn pîrozbahiyên xwe pêşkêşî "Nadiya Murad" û Kurdên Êzidî û hemû wan kesan dike, ku bo bidestveanîna aştî û azadiyê, ji tu awayên zehmet û têkoşînê xwe bêpar nakin.

**Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê**
**14`ê Rezbera 1397`an**

# Xelkê hejar ji ber bilindbûna nirxan nikarin hewcehiyên xwarinê bikirin


**Di Îranê de ji ber bilindbûna nirxa tiştên xwarin û yên din, xelkê hejar û desteng nikarin hewcehiyên rojane yên xwe dabîn bikin.**

Li gorî raportên belavbûyî, nirxa tiştên xwarin û vexarin û tiştên din bi qasekî bilind bûne, ku xelkê hejar û desteng şiyana kirina wan tune ye, ji bo mînak nirxa 1 kîlo sêvik (potato) gihîştiye 4500 Tûmenî û badimcan (tomate) jî di bazaran de peyda nabe.
Eva di demekê de ye ku, karbidestên Îranê rojane, tiştên xwarinê ji bo welatên Îraq û Tirkiyê dişînin, û "Qasim Êzetî" berpirsê Yekîtiya barfiroşên Urmiyê ev yeka pejirandiye ku bilindbûna nirxa badimcanê (tomate) û sivikê, ji ber veguhastina wan bo welatên derve ye, û navbirî pêdagîrî jî kiriye ku sedema serekî a bilnidbûna nirxan şandina tiştên xwarinê bo welatên derve ye.
Rewşa derbazkirina xelkê Îranê bi qasekî xirab bûye ku heya xelkê şiyana kirîna hewcehiyên xwarin, hewcehiyên dersxwendinê bo zarokên xwe … hwd tune ye, û carna jî hevwelatî ji ber destengî û neçariyê bi awayên cuda dawiyê bi jiyana xwe tînin, ji bo mînk roja borî hevwlatiyekî Kurdê xelkê bajarê Urmiyê yê temen 40 salî li şeqama Ferhengiyanê de ji ber destengiyê xwe bidar vekiriye.

Herwisa berpirsê Yekîtiya barfiroşan yê bajarê Urmiyê gotiye ku sêvik (potato) û badimcan (tomate) wekî hewcehiyên rojane yên hemû xelkî ye, û bi kêmkirina veguhastina wan bo welatên derve nirxa van jî wê kêm bibe.

Bilinbûna nirxan di Îranê de, piştî vekişiyana Amerîkayê ji hevkirina Bercamê û danîna dorpêçên aborî li ser Îranê, dest pê kiriye.Hêjayê basyê ye ku, xelkê Îranê şiyana dabînkirina bijêva jiyana xwe tunîn, û bi neçarî dest bi karên kirêt wekî diziyê jî dikin, û berpirsên rejîmê jî, di malên xwe de tirombîlên bi nirx ên zêde wekî "BMW" hene.

## Nerîna Lîderan



Guterres: :

“Nadiya Murad dengê jana veşartî gihande cîhanê”.



Adil El-cubeyr:

“Erebistana Siûdî: Îran li Sûriyê bernameya şîetiyê pêş dixeirîng e”.




Zaxarova:

“Yekrêziya Sûriyê bêyî beşdariya Kurdan nabe



Maas**:**

“Almanya li Idlibê beşdarî ti operasyonan nabe”.

# Rojjimêra topbaranan ji aliyê Spaha terorîstî a Pasdarên Îranê ve



**Destdirêjî û tawanên Spaha terorîstî a rejîma Îranê li hemberî Herêma Kurdistanê û Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê berdewam dikin.**

Tevî ku rêxistina terorîstî a Spaha Pasdaran ji destpêka sala 1397’an a Rojî ve bi awayekî berdewam û bi xurtî navçeyên çiyayî ên Kurdistanê topbaran kirine û tawanên cuda pêk anîne, bi mûşekan jî êrîşî ser baregehên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kir û di encama vê kiryara terorîstî de hin kadr û pêşmerge hatin şehîdkirin.

Roja sêşemiyê 5’ê Pûşperê a sala 1397’an a Rojî, careke din topxaneyên Spaha terorîstî a Pasdaran, çiyayên Hacî Omeran li sînorê Pîranşarê kirin armanca êrîşan. Di van topbaranan de ziyaneke zêde gihaye jîngeya vê navçeyê û beşeke berbiçav ji zozan û çêrîngehan jî di agir de şewitîn.

Demjimêr 7:30’ê êvara 23’ê Pûşpera 1397’an jî, hêzeke dijî gel a Spaha Pasdaran ku ji bo êşandin û acizkirina xelkê li çiyayê Şaho û Quntara Serdere tevger pêk dianîn, rastî êrîşa hêzeke şoreşger hatin û di encama pevçûnan de du pasdarên rejîma Îranê hatin kuştin û hejmareke din jî birîndar bûn.

Piştî bûyerê, Spaha Pasdaran li navçeyê tevgerên din pêk anîn û cihê bûyerê jî, ji aliyê wan hêzan ve bi giranî hate topbarankirin.

Roja 26’ê Pûşperê a 1397’an, careke din rejîma hov a Îranê bi topxaneyên xwe navçeyên sînorî ên Hacî Omeran û Berbezîn ên Herêma Kurdistanê topbaran kirin û di encama vê êrîşa nemirovane de ziyaneke zêde gihaye jîngeya wan navçeyan û du pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî şehîd bûn.

Herwisa roja 15’ê Xermananê, Fermandariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê di daxuyaniyekê de ragihand ku careke din rejîma Îranê dest bi topbarana baregehên sînorî ên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kiriye.

Li gor daxuyaniya Fermandariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, demjimêr 11’ê sibehê, rejîma Îranê li navçeyên sînorî ên Çoman û Sîdekan binkeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê topbaran kirine. Di van êrîşan de, hêzên dijî gel ên Komara Îslamî a Îranê, bi top û xumpareyan û bi alîkariya balafirên bê pîlot, êrîş kirin ser navçeyên çiyayî ên sînorê Çoman li sînorê Pîranşarê û Sîdekan ê Başûrê Kurdistanê û ew navçe bi xurtî topbaran kirin.

Demjimêr 4’ê sibeha 16’ê Xermananê a 1397’an, careke din hêzên dijî gel ên rejîma Komara Îslamî a Îranê, êrîşî ser navçeyên sînorî ên di navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de kirin û baregehên Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê dane ber top, katyûşa û xumpareyan.

Demjimêr 10:45 a roja 17’ê Xermananê a 1397’an, Komara Îslamî bi balafir û mûşekan êrîşî ser baregeh û kampên PDKÎ kir û di encama bombebaranê de du pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê hatin şehîdkirin û sê pêşmerge jî birîndar bûn.

Piştî mûşkbarana 17’ê Xermananê a ser baregehên PDKÎ li bajarê Koye, demjimêr 12’ê nîvro a roja 8’ê Rezberê a sala 1397’an, Komara Îslamî di berdewamiya kiryarên dijî mirovahiyê ên xwe de bi piştevaniya balafirên bê pîlot, çiyayê Kodo bombebaran kir û di encamê de ziyaneke zêde li jîngeyê ket û pêşmergeyek jî bi sivîkî birîndar bû.

Ji sala 1394’an a Rojî ve, hêzên opozîsyona Îranê û bi taybet Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li navxwey welat careke din dest bi çalakiyan kirine û rejîma Îranê jî bi hênceta partiyên Rojhilat, Herêma Kurdistanê topbaran dike.

# Nûnerê PDKÎ di Amerîkayê de digel “Marco Antonio Rubio” civiya

**Roja Duşemiyê 9`ê Rezberê Areş Salih nûnerê PDKÎ di Amerîkayê de, serdana ofîsa “Marco Antonio Rubio” kir, û derheq pirsa Kurd û bandora Amerîkayê axivîn.**

Areş Salih di vê hevdîtinê de, tevî îşarekirina bi mûşekbarana binkeyên Hizba Demokrat ji aliyê Spaha Pasdaran ve, bas ji vê kir ku rejîma Îranê mijûl e vê peyamê dide xelkê Rojhilata Navîn ku Amerîka piştevaniya hêzên demokratîk nake, û ew yek jî di rastî de peyamek nîne, ku Amerîka bixwaze xelkê Îranê û herêmê bibihîzin, li ber vê ku ew peyam xelkê ji Amerîkayê bêhvî dike, û di encamê de deshilata rejîma Îranê di navçeyê de zêdetir dibe.

Navbirî herwisa bas ji gireva sertaserî ya xelkê kurdistanê jî kir û bi senator “Marco Antonio Rubio” ragehand ku ew girev vê rastiyê nîşan dide, ku gelê Kurd di Kurdistana Îranê de digel hizbên xwe ne, û pêgeha civakî ya hizbên Kurd roj bi rojê rû li zêdebûnê ye.

Areşa Salih herwisa îşare bi dîroka 73 salan xebata PDKÎ kir ku serbarê hemû teror û zextên li ser wê, lê PDKÎ li ser piyan maye û pêgeha xwe ji dest nedaye.



Wî her wisa got: Lewra bo me rewa ye ku em bêjin wekî Hizbên Rojhilat, em nûnertiya xwestekên serekî ên gelê Kurd li Îranê dikin, ne nûnertiya tu aliyekî din.

Nûnerê PDKÎ daxwaz ji “Marco Antonio Rubio” kir, ku piştgiriya xelkê Îranê bikin, û bi wan ragehînin ku pişta wan digrin, û dengê nerazîbûna wan dibihîzin, û got: Gelê Kurd daxwaza wê ew e ku hûn nabe li hemberî bidarvekirina xortên xwe de bêdeng bin, û hewce ye ku êrîşa li dijî Hizba Demokrat di Senayê de mehkûm bikin. Hêjayî basê ye ku “Marco Antonio Rubio” ji berbijêrên posta serkomariya Amerîkayê bûye, û niha jî piştî mirina “John Sidney McCain” yek ji girîngtirîn senatorên Amerîkayê di biyavê pêwendiyên derve ên vî welatî tê hesibandin.

»»» Doma R:3

şareza û dabeşkirina deshilatê di navbera malbatên hikûmetî ên xwedan deshilat.

Herweha ragehandiye ku di 40 salên borî de deshilat tenê di destên taqmeke nexwendewar ên bêşerm bûye ku xizm û kesûkarên xwe birine serê, û kirine berpirs!. Partîbazî û bazerganîkirin bo pêşfiroşkirina hilbijartinê jî janeke din e ku niha em derencamên wê dibînin.

Derheq rewşa tevlîhev ya bazara erz jî navbirî got: Yek ji sedemên herî serekî û girîng ên vê aloziyê, pêk tê ji nebûna baweriya xelkê bi rejîmê û nebûna çavdêriya bihêz.

Çima tehrîmên 13`ê Xezelwerê girîng in? ew gera tehrîman pêk tê ji dorpêçên biyavê enirjî û bankê, çalakiyên pêwendîdar bi benderên Îranê û beşên pêwendîdar bi veguhastina deryayî û gemsazî, kirîn û firotina neftê û berhemên neftî, û berhemên pitroşîmî, danûstandinên bazerganî digel banka navendî û navendên din ên malî ên Îranê, beşa enirjiya Îranê, beşa enirjiyê û xizmetên bîmeyê. Bi awrîdaneke kurt bo me eşkere dibe ku tehrîmên vê carê palderên serekî yan bi gotineke din dilê aboriya Îranê wate neft kirine armanc. Îran niha rojane 2 milyon û 300 heya 400 hezar bermîl neftê dişîne, Amerîka jî di bernameya wê de ye ku ew rêje bibe sifir, yan nêzî sifrê, ku di egera cîbicîbûna vê pilanê de, berjewedniya aborî ya Îranê ku pêştir gellek cihê piştqahîmiyê nebû, digel kirîzên cidîtir berbirû dike.

Herifîna dubare û zêdetir ya perê Îranê (di meha Banemerê buhaya Qiran %70 daketiye). Hilkişiyana cardin û zêdetir ya nirxa enfilansiyonê (li gora axavtina Pro. Stev Hankê nirxa healwsanê li Îranê niha %351 e), metirsiya herifîna aborî  bo vegeşîna nerênî, bilindbûna nirxa bêkariyê (Wezîrê kar ragehandiye ku aliyê kêm 1 milyon kesên din tevlî hêza bêkarên welat dibin), vegeşîna nerazîbûnên xelkî bi sedema destengiyê û birçîtiyê (Feramerz Tofîqî serokê komîteya dana me`aş li navenda bilind ya şêvran bi nûçegihaniya hikûmetî ya “ILNA” ragehandiye ku ji detspêka îsal ve heya rêkevt 6`ê Rezberê hêza kirînê li cem texa kedkar a Îranê, %90 kêm kiriye, bi gotineke din hekî kedkarek dikarî di demsala Buharê de sê danan xwarinê bo malbata xwe peyda bike, niha tenê dikare daneke rojê xwarinê peyda bike).

Nemana texa navgîn yan civakê û dehan diyardeyên din, beşek dibin ji vê demsala nû ku xelkê Îranê digel de berbirû ne, hekî li vir de ew xalane wekî fakterên navxweyî berçav bêne girtin, em dibînin ku Rojên çarenûssaz ên Komara Îslamî di rê de ne”.

»»» Doma R:5

hêzên demokrtaîk in, dikarin ji vê pirsê wekî vekirineke dilxwaz bo bangewaza bîrûraya xwe mifahê bistînin.

Tevgera Kurd wekî beşek yan baştir bêjim ku wekî beşa herî srekî ya van hêzên demokratîk din ava erdnîgariya Îranê de dikare ji rewayiya xwe bo serxistina armancên xwe pêngavan hilgire, û digel hemû ewên ku li eniya demokrtaîk de ne, bikeve teamoleke armanctewer.

Kirîza rewayiya rejîmê ji mêj ve ye ku dets pê kiriye û di siberojê de jî li gora egera vegeşandina nerazîbûna li cem xelkê û di hemberî serkuta zêdetir ya wan daxwaziyan de ji aliyê rejîmê ve ew kirîz xwe ji rewşa veşartî û kelekebûyî ve bo rewşa derkvtina obcektîv diguhere, û hewce ye ku ew derfet div ê rewşê de bo rizgariya hemû pêkhateyan li jêr sîbera eqlaniyeta faşîstî ya Îranî-Îslamî bê veguhadtin.

»»» Doma R:4

Boying girêbestek bi buhaya 20 milyard Dolar bo kirîna 100 firokeyên neferhilgir digel Îranê wajo kiribû, ku ew jî hilweşiya. Trump serokê Amerîkayê  di 8`ê Banemerê ragehand ku rêkkevtina navikî digel Îranê kêmasiyeke zaf tê de heye, û her bi van sedeman jî “Washington” tê de derket. Trump di dema hatine ser kar, welatê Îranê wekî binpêkarê Bercamê ji riya vegeşandina pirograma mûşekî û tevdanîkariyê di navçê de, û destêwerdan û yarmetî û piştevanîkirina malî û me`inewî ji terorîstan tawanbar kir.

Meha borî Wezîrê Karê Derve ê Amerîkayê, stratejiya nû ya welatê xwe li hemberî Îranê de ragehand û herweha got jî, ku hekî bê û Îran bi 12 mercên Amerîkayê razî nebe, û digel Amerîkayê rêk nekeve, zextên li ser Îranê wê zêdetir bin.

Heya niha bi eşkereyî û zelalî tu nîşaneyek ji rêkkevtina van du aliyan di holê de nîne, herçend çavdêrên karûbarên siyasî ên Îranê bi dûr nizanin Îran serî bo Amerîkayê dabixe, û digel Amerîkayê rêk bikeve, û xwe ji rûxanê rizgar bike.

## Tirajîdiya kuştina kolberên Kurd berdewam dike

**Kolberekî Kurd yê xelkê Newsûda girêdayî bajarê Pawe, bi teqeya rasterast ya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê canê xwe ji dest da.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Çarşemî 11`ê Rezberê, hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, li ser sînorê bajarê Newsûdê gulle li hejmareke kolberên Kurd reşandin, û di encamê de jî, kolberekî Kurd hate kuştin.

Nûçegihanê "Kurdpa"yê, li bajarê Newsûdê nasnameya wî kolberê Kurd, "Ezîm Ehmedî" temen 42 salî û kurê "Nûredîn" xelkê gundê "Teşar" a girêdayî bajarê Newsûdê, ragehandiye.

Ev kolberê Kurd li cihê bi navê "Sûre herale" de bûye armanca gullereşandina rasterast ya hêzên



leşkerî, û jiyana xwe ji dest daye.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina pêştir, ev kolberê Kurd li ser sînorê Newsûdê dane ber gulleyan.



Roja Duşemî 9`ê Rezberê, kolberekî din yên Kurd yê bi navê "Îkram Xelîlî" temen 27 salî û xelkê gundê "Koran" a girêdayî devera Soma-biradost a girêdayî bajarê Urmiyê, bi teqeya rasterast ya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê canê xwe ji dest dabû. Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê Soma-biradost, bi bê agehdarkirina pêştir, teqe li wî kolberê Kurd kiribûn.

## Guterres: Nadiya Murad dengê jana veşartî gihande cîhanê

**Bi boneya wergirtina "Xelata Aştiyê ya Nobelê" Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres pîrozbahî li Nadiya Murad û Denis Mukwege kir.**

Antonio Guterres li New Yorkê ji peyamnêran re ragihand, ku Nadiya Murad dengê janeke veşartî ji Iraqê gihande cîhanê, ew jî dema rêxistina DAIŞê êriş kire ser Êzdiyan. Guterres diyar kir ku Nadiya Murad qurbaniyeke tundiya seksî bûye û kar kiriye ji bo bidestxistina piştgiriya ji bo qurbaniyên ku hatine bazirganîkirin. Keça Kurda Êzidî û rizgarbûya destê çekdarên rêxistina DAIŞê, Nadiya Murad bi hevbeşî li gel pizîşkê ji welatê Kongoyê Denis Mukwege, Xelata Nobel a Aştiyê wergirtin.

Komîteya Xelata Nobelê îro Înê 5ê Cotmeha 2018ê serkevtiyên îsal ên xelata nobel a aştiyê aşkere kir.

Komîteyê ji bo sala 2018ê xelata Nobel a Aştiyê da keça Kurd a Êzidî Nadiya Murad û doktorê Kongoyî Denis Mukwege.

Nadiya Murad yekemîn Kurd e li cîhanê û duyemîn law e li cîhanê ku Xelata Nobel a Aştiyê werdigire. Nadiya Murad sala 2014ê di êrişa çekdarên rêxistina DAIŞê de êxsîr ketibû destê wan çekdaran û rastî destdirêjiya sêksî hatibû, ku piştî çend mehan ji destê DAIŞê rizgar bû. Komîteya Xelata Nobelê ragihandiye, Nadiya Murad li dijî tundûtîjiyê kar kiriye, û em hewlên Nadiya Murad û Denis Mukwege yên jibo rûbirûbêna tundûtîjiya sêksî bilind dinirxînin. Keça Kurda Êzidî, Nadiya Murad xelkê gundê Koço yê ser bi qezaya Şingalê ve ye, di sala 1993an de ji dayik bûye û di êrişa sala 2014ê de, dayik û 6 birayên wê ji aliyê çekdarên wê rêxistinê ve hatine gullebarankirin. Nadiya Murad dis ala 2016 de bo wergirtina Xelata Nobel a Aştiyê hatibû kandîdkirin, herwiha di sala 2016ê de bi hevbeşî li gel Lemiya Beşar xelata Sakharof wergirtibû.



**HDPê pîrozbahî li Nadiya Murad kir**

Hevserokên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) pîrozbahî li Nadiya Murad û Denis Mukwege kirin, ku "Xelata Aştiyê ya Nobelê" wergirtin. Hevserokên HDPê Pervin Buldan û Sezai Temelli bi boneya wergirtina Xelata Aştiyê ya Nobelê pîrozbahî li Nadiya Murad û Denis Mukwege kirin û ragihandin: "Çalakvana Êzdî Nadiya Murad, dengê jinên ku mexdûrên herî mezin ên komkujiya li Şingalê ne, gihande cîhanê û ronahî xiste ser rastiyan. Nadiya Murad bûye dengê jinên Êzdî ku li dijî hovîtiya DAIŞê li ber xwe dane û bûye wijdana hevbeş a mirovatiyê." Keça Kurda Êzidî û rizgarbûya destê çekdarên rêxistina DAIŞê, Nadiya Murad bi hevbeşî li gel pizîşkê ji welatê Kongoyê Denis Mukwege, Xelata Nobel a Aştiyê wergirtin. Komîteya Xelata Nobelê îro Înê 5ê Cotmeha 2018ê serkevtiyên îsal ên xelata nobel a aştiyê aşkere kir. Komîteyê ji bo sala 2018ê xelata Nobel a Aştiyê da keça Kurd a Êzidî Nadiya Murad û doktorê Kongoyî Denis Mukwege. Nadiya Murad yekemîn Kurd e li cîhanê û duyemîn law e li cîhanê ku Xelata Nobel a Aştiyê werdigire. Nadiya Murad sala 2014ê di êrişa çekdarên rêxistina DAIŞê de êxsîr ketibû destê wan çekdaran û rastî destdirêjiya sêksî hatibû, ku piştî çend mehan ji destê DAIŞê rizgar bû. Komîteya Xelata Nobelê ragihandiye, Nadiya Murad li dijî tundûtîjiyê kar kiriye, û em hewlên Nadiya Murad û Denis Mukwege yên jibo rûbirûbêna tundûtîjiya sêksî bilind dinirxînin. Keça Kurda Êzidî, Nadiya Murad xelkê gundê Koço yê ser bi qezaya Şingalê ve ye, di sala 1993an de ji dayik bûye û di êrişa sala 2014ê de, dayik û 6 birayên wê ji aliyê çekdarên wê rêxistinê ve hatine gullebarankirin.

Nadiya Murad dis ala 2016 de bo wergirtina Xelata Nobel a Aştiyê hatibû kandîdkirin, herwiha di sala 2016ê de bi hevbeşî li gel Lemiya Beşar xelata Sakharof wergirtibû.

# Mehwî û sêgoşeya hebûn, terîqet û şerîetê

»»» Beşa 2

**N: Adil Qadirî**

Her wekî ji şîrovekarî û xwendina vê xezela Mehwî derdikeve, kelecan û xema rasteqîn a Mehwî ciwankarî û xemilandina estetîk a maneyê bû. Tevî ku serdema Mehwî bi rade û asta xwe xwediya şer û alozî û kêşeyên siyasî û civakî û taxim û tiwêjexwazî taybet bi xwe bû. Heyama Mehwî şer û hevrikiya navbera du rêbazên terîqeta Neqişbendî û Qadirî bû, di vê navê de rêbaza Neqişbendî weke guherînxwaz û xwenegirtî li hember buhayên nû û rengekî ji modernîzmê dihat hesibandin û rêbaza Qadirî ev dikir mohreke neresen û bi wan ve dikir, lê Mehwî neket dava îdeolojiya reha ya ti rêçik û rêbazekê.

Tevî ku piştî ji rêwîtiya hecê çû Stenbolê û li wir bi riya mirovên Kurd ên xwedî statû û hegemonî, Sultan Ebdilhemîdê Osmanî dît û Sultan xizmeta wî kir û destê xwe li hember wî vekir û xaneqayek jî jê re vekir, lê dîsa serxwebûn û ciwanperistiya xwe ji dest neda û serbestî û tenêtî û îzolebûna xwe di tekstên xwe yên şiîrî de berçav kir, di dawî de em wî ne wek şaîrekî ser bi filan taxim û bere û grûp û aliyê siyasî yan civakî û dînî û îdeolojî ve nas dikin, lê em wî wek helbestvanekî estetîkzan nas dikin. Tew kesên ku xwe ji van formên estetîkzan û ciwanperist ên Mehwî wek rêbazeke azad û bilind dane alî jî, li jêr navê waiz, şêx, sofî û zahid ketine ber rexneyên Mehwî. Lewma di helbestên Mehwî de ev çar karakter ku nûnerên çar gûrpên alîgir û îdeolojîk in, car caran behsa wan hatiye kirin û maske ji ser rûçikê wan ê nediyar û pirreng hatiye rakirin û Mehwî ew dane nasandin. Şaîr di şiîrên xwe de her yek ji van bi cuda li ser tayekî terazûyê datîne û li tayê din jî ciwanî, ciwanperistî, hêma û nîşanên ciwaniyê datîne û giraniya ciwanînasiyê bi radeyekê ye ku wan karakteran li ser tayê terazûyê wiha belav dike, ta nasîna wan weke cara yekem dijwar û zehmet e. Wek mînak di van herdu beytên xezeleka xwe de dibêje:

Waîzim pirsî: Yekê şoxane ciwabî damewe:
Weizî çî?! Serlinge destarê kirrey destarî hat

Anku min nûçeya waîzan şîretkar pirsî, lêbelê yekî bi henekî û tinazî û laqirdî bersiva min da ku weiz û şîretên çi û halê çi?! Dev û zimanê waîz wek destareke xwar e, dema dipeyve, gotinên wî baş hûr nabin û nayên fêmkirin, çimkî ji aliyekî tenê yê destarê sûd tê wergirtin, lewma deng jê tê û li guhê guhdaran giran tê.

Yan di beyteke din de dibêje:



Şêx û turrey mêzer û neql û nuqulî hîç û pûç
Min be turrey yar esîr im ew be kolê turrehat

Li vir her wek min li jor jî qal kir, Mehwî şêxan jî wek desteyekê ji wan taximên ku min qala wan kir, dide ber rexneyan û dibêje: Şêx û pêça mêzera wî û gotinên wî yên hîç û pûç amade ne, lê ez li şûna ku hogir û îtaetkarê wan neql û gotinên hîç û pûç bibim, ez stûxwar û êxsîr û fermanberê temberîk û zulfên xelek ên yarê me ku di beyan û rastbêjiyê de tije û dagirtî ne û şêx û dûvelankên wî nagihin bejnûbala wê. Li vir derketin û amadebûna nerîngeha civakî û hinek rûkarên aşiqane yên cîhana Mehwî ku pêwendiyeke wan a berçav ligel îrfanê heye, tên behskirin.

Di berdewamiyê de ez ê nimûneya xezeleke şaîr bînim ku têde eşq li ser îrfanê serdest bûye û rê jî li ber hinek têrmên felsefî yên di ser eşqê re vekiriye.

Serketina eşq û felsefeyê li ser îrfan û dîn, yan terîqet û şerîetê
Dewrî her çawêkî emrro dawe sed fewcî bela
Dîn û dil yexma deken, çarî ken ey şêx û mela

Yanî: Li dora çavên yarê sed fewc û kom ji derd û belayan dizîvirin, ey yarperist agahdar bin ji wan sed komên belayên çavên yarê bêguman her digihe we jî. Dîn ku hêmaya şerîetê ye û dil ku hêmaya terîqetê ye, li vir eşqê talan dikin, lewma ey dilperist, anku cenabê şêx û ey dîndar, ey cenabê mela rê li ber vê talankariyê bigirin ku bi sed fewcên bela ji çavên kûr û bêbinî yên yarê dizên. Wek tê dîtin di vê beytê de dîn û dil ku ligel şêx û mela tiştên mişeweş pêk tînin, li jêr baskê êrişa fewcên eşqa çavên yarê bi talan çûne. Di vê beytê de eşqa tazî serdest e. Tazî bi du maneyan!

Yan:
Wesiyetî Mecnûn e: Her kes derdî dinya `ar e boy
Xo bika wek min be derdî îşqî yarê mubtela

Ev beyt jî wek ku berencama hevrikî û şerê grûp û tuxmên nav beyta berê de ango dîn û dil, şêx û mela, sed fewcên bela bin, encamgirtin û tezeke ontolojîk yan hebûnnasî di rêgeha eşqê de raberî me dike. Mehwî di vê beytê de dibêje: Wesiyeta Mecnûn ku wek aşiqekî dîn navno bûye, bi rastî ew bû ku eger barê wicûd û hebûnê li ser we giran bû, derdê dinyayê bi we nehate debarkirin û pûçiya dinyayê li ba we wiha derket ku kişandina barê derdê wê ji bo we `ar û ne ya kirinê bû, çareya baş ew e bi riya aşiqbûna bi yarekê û gîrobûna bi derdê eşqa wê hûn xwe bixapînin û xafil bikin.

Yanî eşq ne gewher û zêrekî resen e, lê resenî li vir girêdayî derd û renca “hebûn” û dinyayê ye ku dikare bi riya eşqê bê sekinandin û jibîrkirin. Yanî yar li vir ne pût û ne qîble û ne senem e, lê derman û riya felatê ye.

Wek min li jor jî qal kir, ev beyt aliyekî hebûngerî vedihewîne. Bi rastî ev raveya Mehwî ji bo eşq û saman û mîrata Mecnûn ji hemû şaîrên heyama wî nûtir û balkêştir e. Lewma ez vê xezela Mehwî ku ji 7 beytan pêk tê, wek yek ji şahxezelên wî dibînim. Dawî

# Zimanê Kurdî




- Em : Bo kesên peyver ên pirjimara her dû

zayendan e (nêr û mê)
Wek : - Em lawên welatê xwe ne .

- Em keçên Kurdistanê ne .
b- (Tu, Hûn) : Cînavên kesê dûwem ê guhdar in (yên

ku bi wan re tê peyivandin) .
- Tu : Bo kesê guhdar ê yekjimara her dû

zayendan e .
Wek : - Tu kurrê kê yî ?

- Tu keça kê yî ?
- Hûn : bo kesên guhdar ên pirjimara her dû zayndan

e.
Wek : - Kurrino, hûn ji kû ne ?

- Keçino, hûn ê biçine kû ?
C- (Ew) : Cînavê kesê sêyem ê nediyar e .

Ev cînav bo her dû zayndên nêr û mê,
yên Yekjimar û komjimar bikar tê .
Wek : - Min Restem dît, ew diçû malê

- Min Mizgîn dît, ew jî diçû mala xwe .
- Min Şêrgo û hevalên wî dîtin, ew diçûn dibistanê
- Zîn û hevalên xwe bi rê ve bûn, ew dihatin malê.




Hêja ye bîranînê ku Seyda Reşîdê Kurd navê cînavên koma (ez) kiriye “cînavên salt”( )û navê yên koma (min) kiriye “cînavên serkar” . Lê Dr. Qenatê Kurdo navê cînavên koma (ez) kiriye “cênavên dema rast” û yên koma (min) kiriye “cînavên tewandî” . Di şêwezarê (K.J) de cînavên koma (ez) di van dem û raweyên hevokan de bikar tên :

1- Bi karê (bûn)ê re :

Di zimanê kurdî de (2) celebên karê (bûn)ê hene :
a- (Bûn)a bi wateya (heyîn, hebûn), ku di zimanê Farisî de (hesten) e û di zimanê Ingilîzî de (verbe to be) ye û di zimanê Erebî de (keynûne - فعل الكينونة) ye . Bûyera vî karî heyîna (hebûna) rewş û çawaniya kesekî yan tiştekî eşkere dike . Wek : - Serkêşê hevalan Soro bû

# Agirî

Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
www.Kurdistanmedia.com
www.Agirimedia.org
rojnamaagiri@gmail.com
www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (335)

## Alîkariyên komkirî yên bo erdhejlêdayî yên Kirmaşanê, bo me`imuriyetên îdarî hatine xerckirin

**Piştî derbazbûna nêzîk bi salekê bi ser bûyera dilgiran ya erdheja Kirmaşanê, heya niha jî xelkê lê qewmî yê wê deverê di nav kanêksan û xêwetan de jiyan dikin, û alîkariyên ku ji aliyê xelkê ve hatibûne komkirin ji bo me`imoriyetên îdarî yên dewletê hatine xerc kirin.**

Ehmed Seferî, yê bi nav nûnerê Kirmaşanê, yê di meclisa rejîmê de, tevî eşkere kirina vê nûçeyê, ragehand ku: Piştî derbazbûna nêzîk bi salekê bi ser erdheja Kirmaşanê, heya niha jî xelkê lêqewmî yên vê bûyerê, niha jî di nav kanêks û xêwetan de jiyan dikin û heya niha zelal nebûye ku ev bodca ku bo nûjenkirina vê deverê hatibû destinîşandkirin û ew alîkariyên ku ji aliyê xelkê bajarên din ve hatibûne komkirin çi bi serê wan hatiye.



Navbirî gotiye ku: "Bonyada Mesken" heya niha bi qasî 28 milyard Tûmenî ku ji aliyê xelkê ve hatiye komkirin bo xelkê lê qewmî şandiye, û ev bi navê mei`moriyetên karmendên xwe bo hebûna wan di deverên erdhej lêday de xerc kiriye.

Çalakvanekî devera "Serpêlê" di pêwendyeke telefonî de bo malpera "Kurdistanmedia"yê, ragehandiye ku: Mixabin heya niha ne dewlet û ne jî îdareyên pêwendîdar amade nebûne da ku bi micid ve çav li rewşa jiyana xelkê lê qewmî bikin, û dema ku berpirsekî hikûmetê jî serdana wir dike, komek axavtinên derev û vala û sozên bê bingeh didin û dicin.
Li gorî gotina wî çalakvanî medenî ku nexastiye navê wî eşkere be, niha xelkê lêqewmayî, piştî derbazkirina dijwarî û tengahiyên zêde, di demsala havîn û zivistana sala borî de, û herwisa bê hêvîbûna li alîkarî gihandinên dewletê, ro li hin karan kirine da ku bikarin serpenahekê bo xwe dabîn bikin.
Heriwsa navbirî ev yeka jî daye eşkere kirin ku: Bi sedema givaşan û dijwariyên jiyanê, parek li xelkê erdhej lêdayî yê Kirmaşanê, heta amadebûna Kucikên xwe bifiroşin, da ku bikarin avahiyekê bo xwe çê bikin û xwe ji sirr û seqema zistana bê de biparêzin.
Rejîm heta amade nebûye, bodceyeke zelal bo nûjenkirina xwendingeh û nexweşxaneyan jî destnîşan bike, û her bi vê sedemê jî, li gorî gotina serokê şêvra bajarê Serpêlê, îsal tenê bi awayê sembolîk çend xwendinigeh hatine vekirin û yên din jî her daxistî mane û dersxwen li vê mafê bingehîn jî bêpar mane.

---

# Biryarnameyeke Amerîkayê, rejîma Îranê êşand

**Kongireya Amerîkayê derheq hevkariya rejîma Îranê bi eniya Polîsaryo re biryarnameye weşand.**

Li gora rapora "Middle East Confidential" kongireya Amerîkayê bi weşandina daxuyaniyeke duhizbî, hevkariya eniya Polîsaryo di Sehraya Rojava digel Hizbullah a Lubnanê û Îranê bona nearamkirina bakûra Afrîqayê şermezar kir.
Ew biryarname ku ji aliyê sê nûnerên naskirî ên kongir ve hatiye amadekirin, dibêje ku Mexrib hevpeymaneke bihêz ê Amerîkayê ye bo aştiya di bakûra Afrîqayê de.
Vê biryarnamê herwisa piştevanî kiriye ji hewlên NY bo destpêregihîştina bi biryarnameyeke aştiyê di Sehraya Rojava de.
Di vê biryarnamê de hatiye ku Amerîka ji terhê otonomiya herêma Sehra li jêr deshilatdariya dewleta Mexrib de piştevaniyê dike, ku eva 10 sal e ew yek helwesta Amerîkayê bûye, û vê helwestê cidî dizane. Vê biryarnameyê tevî îşarekirina bi biryarnameya 1441 ya Konseya Ewlekariyê ya NY ku Washington piştgiriya wê dike, kiryarên têkderane ên eniya Polîsaryo rexne dike, û daxwaza derketina bilez ya Polîsaryo ji herêma Sehra dike, ku di bin deshilatdariya eniya Polîsaryo de ye.

Vê biryarnameyê piştevanî ji qutkirina pêwendiyên dîplomatîk ên Mexribê digel Îranê kiriye, bi sedema piştevaniya rejîma Îranê ji eniya Polîsaryo, û herwisa hêzên Hizbullahê ji vê eniyê.
Eniya Polîsaryo tevgerek e di Sehraya Rojava de, ku hinek beşên vê herêmê di destên wê de ne, û dixwaze Sehraya Rojava ji Mexribê veqetîne.

Rejîma Îranê ku xelkê welatê xwe di hejarî û destengiyê û di nava bi hezaran kêşeyên civakî û aborî û siyasî de bat kiriye, hemû jî di encama heman vê siyaseta gemar e, ku pere û dahata xelkê welat bo girûpên weha dişîne. Armanca rejîmê jî, ne xizmetkirin e bi tu tevgerekê, belku têkdana aramiya welatên cîhanê ye, bona vê ku bala bîr û raya giştî li ser wan û deshilatdariya wan ya dijîgelî nemîne, siyasetek ku bêguman encameke baş bo wan tunabe.

---

## Dewleta "Fransa"yê dest bi ser darayên Wezareta Îtila`ata rejîma Îranê de girt

**Dewleta "Fransa"yê ragehand ku, dest bi ser darayiyên Wezareta Îtila`ata rejîma Îranê, û dîplomatekî Îranî û du hevwelatiyên din yên Îranê yên di vî welatî de girt.**

Dewleta "Fransa"yê, dîplomateke rejîma Îranê û du hevwelatiyên din yên Îranê, ku dixwastin di civîna "Mucahdînê Xelq" yên di wî welatî de, ku di roja 9`ê Pûşperê bi rê ve çû, û di vê civînê de nêzîkî 25 hezar kesî beşdar bibû, kiryarên terorîstî encam bidin, destbiser kirin û dest bi ser darayên wan de girt.

Piştî vê ku dewleta "Fransa"yê ev dîplomatê rejîma Îranê û digel du hevwelatiyên din yên Îranê ku di vî welatî de kar dikirin, derhqê vê kiryara terorîstî destbiser kirin û dest bi ser hesabên bankî yên van û yên Wezareta îtila`ata rejîma Îranê de girtin, Îranê jî daxwaza azadkirina bilez ya wan endamên xwe kiriye.

Wezaretên Karê Derve û Wezareta Aborî ya "Fransa"yê di daxuyaniyeke hevpar de, derheq "bernameya êrîşa bo ser civîna Mucahidînê Xelq a di nav axa "Fransa"yê de, ragahendin ku: "Ev kiryara gellek micid e û em nikarin wê bê bersiv bihêlin".

Herwisa Şêvra Ewlehiyê ya "Koçka Spî" jî ev helwêsta hêzên ewlehiyê yên "Fransa"yê derheq "kiryara terorîstî a bê encam ya Îranê ya li Parîsê" de gellek bihêz da zanîn, û berdevka Wezareta Amerîkayê jî di gotûbêja digel nûçegihanan de tevî îşarekirina bi bûyerên heyamên borî de, komara Îslamî "piştevanê serekî yê terorîzmê" da naskirin.

Herwisa di berdewamiyê de, li ser rûpela "twitt"a xwe nivîsî ye ku "Tehran dibe bizane ku digel reftarên wiha yên şermane nikarin ser bikevin.